# DÎROK XWE DUBARE DIKE!

Devî bi xwîn merivxurê serhişk û xêv,
Hezar dewr çûn, bi zorekê bû merivkuj,
Hê jî diçe – bi r’ik û k’în, bi destên xwîn,
Û ji r’êya mirovbûnê hê p’ir’ dûr e.

(Hovhannês T’ûmanyan – Helbestvanê ermenî yê dawîya sedsala XIX– destpêka ya XX)

**Ezîz ê Cewo**

**DÎSA LI K’URDISTANÊ HEWAR E!**



*Dema êrîşên hevp’ar ên HTŞ/DAÎŞî yên Şamê û r’êjîma faşîst a T’irkîyayê li ser T’axên k’urdan ên Helebê.*

Ev êrîş, ên ku li ser t’axên k’urdan ên Eşrefîyê û Şêx Meqsûdê yên Helebê û R’ojavayê K’urdistanê pêk hatin û îro jî didomin, em careke dinê veger’andin dema t’evgera t’evkujîyê ya Enfalê (di nava wê da wisa jî – k’îmîyebarana Helebçê!), ya ku r’êjîma Seddam li dijî gelê k’urd li Başûrê K’urdistanê pêk anîbû.

Wê demê cîhana ku xwe şaristanî dihejmêre, li hember wan hovîtîyan bêdeng ma …

Em jî ji hev dûr bûn, destê me nedigihîşt hev, heya agahî jî bi derengî digihîştin me.

Eger îro têlêvîzîon, întêrnêt û p’ergalên dinê yên r’agîhandinê agahîyên di derbarê van hêvîtîyên r’êvebirîya Şamê ya DAÎŞî û r’êjîma T’irkîyayê a faşîst da (ev jî – ya DAÎŞî!) li dû hev r’adigîhînin, lê wê demê her dereng, piştî demekê hinek fotoyên di derbarê hovîtîyên r’êjîma Seddam Huseyn da gihîştin ber destê me…

Û wê demê ew agahî û wêne bûn sedem û bingeh, ku poêma “Dojeh” bê nivîsîn.

Û di wê da wisa jî gotinên weha hene:

*... U t'a îro jî, wek wan pêşîyên xwe,*
*Ew dijminê me dîsa maye ew,*
*Ger lê pêwîst be, me dighîne xwe,*
*Lê-k hema dem tê, me zol dike ew! ...*

*Û em zol dibin mîna ç'ermê gê,*
*Zol dibin, ne ku b'destê Ç'engzêr'în,*
*Lê mîna ewî ç'ermê gaê çê,*
*Yê-k k'etye devê seyê devbixwîn.*[1]

Û îro jî heman tişt li hember gelê k'urd pêk tê – vê carê li R'ojavayê K'urdistanê!

Û, eger dema enfalê cîhan li me dûr bû, ew li hember trajêdîya gelê k'urd ker' û kor û lal bû, lê vê carê, hêzên hevpeymanî yên navnet'ewî, yên ku hêzên k'urdan bi wan r'a mil bi mil li dijî DAÎŞê ditêk'oşîyan, û ew îro jî bi baregehên xwe yên leşkerî va li herêmê ne, bi daîşîyan r'a peyman girêdane, xwe dane alîyekî û ew ç'ekdarên t'underaw, bi piştgirî û hevk'arîya leşkerî ya r'êjîma faşîst a T'irkîyayê, êrîşên t'unekirinê tînin ser k'urdên hevpeymanîyên wan, ji ber ku di nava wan û DAÎŞ-îyên Şamê û r'êjîma Ankarayê da bazarîyek pêk hatye, û wan li hev kirine. Û ewana bi xwe bi r'êya T'om Barrakê nûnerê t'aybet ê serokdewletê DYA Donald Tramp ê bi k'arên Sûrîyayê vekirî r'adigihînin, ku armancên hevk'arîya DYA û HSD naha hatine guhar'tin...[2]

Baş e, armancên we hatine guhar'tin, lê têk'oşîna hevp'ar a dijî DAÎŞ-ê, lê mirovahî û mirovbûn, lê bext, lê wijdan, lê exlaq li k'u man? – An ev Sayk's-Pîkoya duyem e?!

Helbet, ev pirs hr'êtorîk in, pêdivîya wan bi bersîvan nîne, bersîvên wan di wan bi xwe da hene.

Ev tiştekî nû nîne, bi dîrokî hatye piştr'astkirin, ku têgînên weha ji bo dewletan qîmetê xwe nînin, ku armancên wan hene, yên ku dikarin bên guhar'tin. Û divê mirov hert'im amade be, ku ewên ku îro hevpeymanîyên wî ne, dê r'ojekê ji bo xatirê berjewendîyên xwe yên r'ojane, an di nava çarç'oveya peymaneke navdewletî da ji wî r'a xiyanetê bikin ...

Bi dîtina me, pêwîst nake, ku mirov li vira matma bibe, an şermezar bike! Her dimîne, ku bê deng ji xwe r'a bibêje – bila ev jî bibe dersekê, û ji van hemûyan bi r'astî jî dersan derxe! Wê demê mirov dikare bibêje, ku ew windayên ku gelê me dane, bêfeyda neçûne. Û em jî, wek net'ew, diranên xwe biç'ir'ikînin û bi pêşva her'in! An – na, dîrokê me efû neke.

Wisan e, wek ku hesin di nav êgir da qal dibe û dibe pola, net'ew jî, di nava agirê têk'oşîn û berxwedanan da, di agirê xiyaneta dost û hevpeymanîyên lêp (sexte) da dibe pola!

Wisan e – dîroka mirovahîyê vê ji me r'a dibêje!

Û ev cara yekem nîne, ku di demên here teng û krîtîk da DYA k'urdan li hember êrîşên kujerên wan t'enê dihîle: dema p'êla yekem a t'evgera leşkerî ya li dijî Seddam Huseuyn jî wisa bû, dema hêzên amêrîkî xwe vek'işandin û art'êşa BAASî ya Seddam li k'urdan veger'ya, t'evkujîya wan pêk anî, k'urd p'enaber bûn û li seranserê cîhanê belav bûn – li serê r'êyan, p'enaber, hêsîr û sergedan! Û dema êrîşên r'êjîma faşîst a T'irkîyayê yên li ser Efrînê jî wisa bû, dema art'êşa Tirkîyê li ber ç'avê hêzên hevpeymanî, di bin pozê wan da bi hemû hêzên xwe va êrîş anî ser Efrîna r'engîn û ew dager kir ...

Û naha jî – ev!

Di R'ojava da baregehên hevpeymanîyan hene, hêzên k'urdan bi wan r'a mil bi mil li dijî DAÎŞ-ê têk'oşyane, lê îro hêzên hevpeymanîya DAÎŞî ya Şam û Ankarayê (ya HTŞ-AKP/MHPî) li dijî HSD-ê û gelê k'urd (ên ku hevpeymanîyên DYA ne!) şer'ekî t'unekirinê dimeşînin, nûnerê t'aybet ê DYA r'adigihêîne, ku armancên hevk'arîya DYA û HSD naha hatine guhar'tin. Û k'urdan li ber êrîşên hevp'ar ên hêzên Şamê û Ankarayê (yên DAÎŞî!) t'enê dihêlin, ne bes e, hewl didin, k'urdan neç'ar bikin, ku dest ji hemû destanînên xwe bik'işînin, û bik'evin nava sîstêma DAÎŞî, ya ku ne ku t'enê şêwazê dewletbûnê negirtye,

[1] Hûn dikarin helbestê bi t'evahî li vira bixwînin: https://amidakurd.net/ku/tekst/DOJEH

[2] Daxwîyanîya Tomas Barrak li vira ye: https://nupel.tv/barrack-abd-sdg-ortakliginin-gerekcesi-degisti-amac-buyuk-olcude-sona-erdi/

lê, her weha, her wek girseyeke t'evlihev a bê ser û ber (konglomêrat/conglomerate) a k'omên îslamî yên t'unduraw li holê ye, yên ku ji bilî kuştin û t'alanê tiştekî dinê nizanin. Û evên ku desthilata Şamê hildane destê xwe, dibe ku ji sedî sîhê wana jî ne sûrîyayî ne...

Lê, her çi jî hebe, r'ewş îro hatye guhar'tin: ne Cîhan êdî ya berê ye, ne jî – gelê k'urd!

Û em îro êdî ne k'urdên berê ne!

Binihêr'in, çawa gelê me li herçar p'arç'eyên K'urdistanê û li çarhêlên Cîhanê r'abûye ser p'êyan û li R'ojava xwedî derdik'eve. Belê, li R'ojava – Başûrê biç'ûk, delalîya k'urd û K'urdistanê a dilovan, a ku ji ewqas r'êber, t'evger, têk'oşr, bîrewar û r'ewşenbîrên k'urd r'a malovanî kirye, ya ku dot û lawên wê yên here hêja jiyana xwe ne t'enê li R'ojava, lê li herçar p'arç'eyên K'urdistanê heya dawîyê bê hêvişandin dane doza net'ewî !...

Ev ji bo wat'edarkirin û têgihîştina r'ewşê – bi giştî!

Û di vê r'ewşê da, dema me li weşanên cuda dinihêr'în, û dîmenên cuda dihatin, xwe li ber hev diguhar'tin, dîmenekî zar'okekê hate xuyan, hestên ciyawaz di dil û gîyana me da r'ûdan, û dîsa hinek gotinên ji poêma me ya navborî, ya "Dojeh" hatin bîra me:

*...Ey, biborîne, tu-t'ifalê min,*
*Ji evan derdan min tu j'bîr kirî,*
*Çiqas giran e îro kula min –*
*Gişk t'evî hev bûye – bûye gêjger'îng...*

*Biborîn, ku min wêneyê te dît*
*(Ya Xwedê, çiqas gunehk'ar im ez!?)*
*Û ne ku hatin bal te – wî berî,*
*Tu wisa hiştî bê kinêz û kes! ...*

Helbet, her kesek bi awayê xwe vê r'ewşê, van bûyeran di nava hest û hîs û bîr û r'amanên xwe r'a derbaz dike, wat'edar dike û bi wan dijî!

Û ewê hert'im bi wî ra bin...

## LÊBELÊ, LI VIRA PIRS DI WÊ DA YE, K'A, DIVÊ MIROV VÊ R'EWŞÊ ÇAWA BIXWÎNE?!

Bi r'astî, mirov dixwaze têbigihîje, k'a, gelo ev bûyer, ên ku di herêmê da pêk tên, anegorî r'êgezên pêvajoyê yn heşmendî ne, an destekî dinê yê nep'ak û neçê di nava wan hemûyan da heye? Ew, ku ev hemû li dijî mafên gelê k'urd ên mirovî û net'ewî veger'yane, wek di nava gel da tê gotin, korê koran jî dibîne...

Lêbelê, wisa jî balk'êş e, k'a eva ku pêk tê, dik'eve xizmeta berjewendîyên net'ewî yên DYA, an berîkên k'omek bazirganan, ên ku li dor Donald Tramp berev bûne!?

Ma, gelo, dikare, ku r'êvebirîyên DYA û Ewropayê nizanin, k'a DAÎŞ çi ye, k'a ev k'omên ç'ekdar ên daîşî-el-qaidayî û Colanî k'î ne, k'a ew çawa li Şamê p'eyda bûne (ma ne, agahîyên wan ji yên t'evan p'ir'tir in!). Lêbelê, bi dîtina me, dîsa jî pêwîst e, ku mirov awir'ekî biavêje ser şopa van bûyeran û wana jinûva r'avebike.

Bala xwe bidinê, hê derdorê salekê berê (09. 02. 2025.) me di gotara xwe ya "R'ewşa Sûrîyayê piştî têkçûna r'êjîma BAASî, pirsgirêka k'urdî û r'êyên ç'areserîya wê!" da bal k'işandibû ser t'erefê r'êgezî yê têgîna "k'etina r'êjîma BAASî ya Sûrîyayê".

Û me li wir destnîşan kiribû, ew, a ku r'êjîma BAASî ya Sûrîyayê têk çû, ne t'enê û ne ewqasî encama êrîş û fişarên hêzên ç'ekdar ên k'omên el-qaydayî[3] yên ji derva hatî bû, çiqasî ji ber r'izîbûna r'êjîmê ya ji hindur'va û ner'azîbûna gel û k'arbidestên dewletê bi xwe, û di encamê da ev k'om hatin û li ser k'ilafe û k'elaxê r'êjma her'ifî r'ûniştin …

Lê, her çiqas van k'oman, ên ku li ser vê p'êlê di qesra Şamê da p'eyda bûn, parlamênto, hemû sazî û dezgehên berê, art'êş û hêzên ewlek'arîyê, partîya BAAS û heya r'êxistina

[3] *El-qāʿidah* ji hêla gelek dewletên cîhanê va wek r'êxistinek a têr'êrîstîya navnet'ewî hatye naskirin.

xwe – ya Heyet T'ehrîr eş-Şam (HTŞ)[4] jî betal kirin, û erk'ên serokk'omarîyê û wezîran di nava xwe da p'arvekirin, lê, yek e, bi van hemûyan jî pirsgirêkên vî welatî ç'areser nebûn. Berovajî vê, mirov dikare bibêje. r'ê li pêşîya pirsgirêk û alozîyên nû hate vekirin. Û dest bi pêvajoyeke nû bûye…Lewra jî pirsên di derbarê pêşer'oja vî welatî da ji bersîvan zêdetir in.

Lê, eger mirov van pirsan dayne hêlekê jî, pirseke dinê ya girîng a r'êgezî li ber me seknye: "Evên ku xwe wek serokk'omar, wezîr û niznim – çi û çi, erk'dar kirine û r'agîhandine, k'îjan kongrê (an meclîs) a gel ew hilbijartine û erk' dane wan, û anegorî k'îjan qanûnê yan destûrê ne? Ji van erk'darên dewletê yên îro-cerdevanên demekê yên îslama r'adîkal çend mirov hemwelatîyên Sûrîyayê ne? Ew nûnertîya k'îjan Sûrîyaê dikin, û ji navê k'îjan Sûrîyayê diçin hevdîtinan? Ev hevdîtin û erk'adarkirina wan bi xwe çiqasî r'ewa ne? Ma Amêrîka (DYA) û Ewropa (YE) evê nak'okîya berbiç'av (kazûs) tê nagihîjin, an dizanin, lê bi zanebûn r'ê li pêşîya wan vedikin, .... ?"

Ma ne, dema van k'om û k'omikên ç'ekdar, her yek ji wana ji xwe r'a k'etibûne herêmên cuda û, k'ê çawa dikaribûye, xwe îdare kiribûye, ev êdî zêdetirî deh salan e, li Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê (R'ojava) herêmek a xweser heye, bi beşdarbûna nûnerên hemû pêkhateyên herêmê r'êvebirîyek a xweser hatye avakirin, sazî û dezgehên dewletek a bi r'êk û pêk hatine damezirandin, bi misogerîya mafên hemû pêkhateyan, ên beşên civakê yên cuda û zayendan va. Û di r'ewşeke weha da, evên ku xwe r'êvebirîya Sûrîyayê r'agîhandine, bêyî ku bingeh û cêr'ibandinek a xwe ya r'êvebirîyê hebin, ç'avê xwe li ber van destk'evtîyan digirin, wek ku ji bilî wan di vî welatî da tiştek nîne! Ew bi vê helwesta xwe dixwazin çi bibêjin? – Bi r'astî, ev tiştekî dûrî têgihîştina mirov a normal e!

Û ya dinê, eger ev mirovana xwe r'êvebirîya vî welatî dihejmêrin, r'êjîma faşîst a T'irkîyayê bê navber êrîşan tîne ser Herêma xweser a Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê û t'evkujîya gelê medenî pêk tîne, çima dengek ji vê "r'êvebirîyê" dernayê?...

Ma mirov evê çawa têbigihîje, ev tê çi wat'eyê? Ev nayê wê wat'eyê, ku li vira armancên van k'omên el-kaydayî û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê yek in, ku herdu jî naxawazin hîç mafekî pêkhateyên Sûrîyayê nas bikin? …

Eger – na, mirov evê çawa dikare şirove bike?!

Evana bi van bir'yarên xwe berê R'êvebirîya Herêma Xweser didin k'u?

Û li vira pirsek a dinê jî r'û dide – di r'ewşek a weha da R'êvebirîya Herêma Xweser divê çawa t'evbiger'e? Gelo, dema evan k'omên ç'ekdar ên îslama r'adîkal, ên ku di Sûrîyayê da xwe gîhandine desthilatê û bi nûnerîya DAÎŞ-ê (Erdoxan) r'a k'etine nava hevk'arîyê, r'êvebirîya Herêma Xweser dê bikaribe bi wan r'a zimên bibîne, an, r'asttir dibû, mirov bigota – gelo hêja ye, ku tiştekî mirov ê hevp'ar bi wan r'a hebe? Bi vî awahî, gelo, hemû destk'evtîyên gelê R'ojava û Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê dê nek'evin nava xeterîyê?[5]

Ango, hê wê demê, salekê berê guman û metiesîyên me hebûn, ku destk'evtîyên gelê R'ojava û Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê dê bik'evin nava xeterîyê. Û ev ne konspîrolojî bû, ev encama nirxandin û analîzên bûyerên îro, mînakên dîrokî û r'abirdûya wan k'omên îslama r'adîkal bû. Bi vê mijarê wisa jî piştî mehekê (10.03.2025.) hinek nirxandinên me bi sernivîsa "R'ojeva k'urdî ya cîhanê, pêvajoya aştîyê û pêşk'evtinên Sûrîyayê" hatin weşandin.[6]

Û, bi r'astî, piştî ewqasî r'a mirov nikare tê bigihîje, dema serokdewletê DYA Donald Tramp serekcerdevanekî DAÎŞî vedixwîne bal xwe, destê xwe li pişta wî dixe, dibêje, ku ew

---

[4] Ev r'êxistina berfanbara 2017-an li ser p'êla şer'ê navxweyî yê Sûrîyayê li ser bingeha k'omên îslama r'adîkal ên dijberî r'êjîmê yên wek: *Cebhat Fat'h eş-Şam (Cebhat en-Nûsraya demekê), Cebhat Ensar ed-Din, Cêyş es-Sûna, Lîva el-Heq û Nûr ed-Dîn ez-Zenkî*, pêk hatibûye. Paşê bi giştî derdorê sîh k'omên cuda di nava vê r'êxistina da hebûne.

[5] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞ A_SÛRÎYAYÊ_PIŞTÎ_TÊK ÇÛNA_R_Ê JÎMA_ BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_URDÎ_Û_R_ÊYÊN _Ç_ARESERÎYA_WÊ

[6] https://www. amidakurd.net/ku/tekst/R_OJEVA_K_URDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_ AŞTÎYÊ_Û_PÊŞK_EVTINÊN_SÛRÎYAYÊ

xortekî çê ye. Ev çi ye? Bir’êz Serokdewlet dixwaze cerdevanekî daîşî-el-qaydayî li ber ç’avê cîhanê r’ewa bike, an di nava pirsên r’ojane yên wî camêrî da ev pirsa ya here biç’ûk e (hem wek serokdewlet – bi hemû pirsgirêkên xwe yê cîhanî va, hem jî, wek kesekî k’arsaz – bi pirsên xurtkirin û berfirehkirina k’arê xwe yê sermaydarîyê va!), û, k’a, gelo, şêwirmendên wî pirsan çawa r’aberî wî dikin, ew wan pirsan anegorî wê jî hiltîne dest û ji bo wan ç’areserîyan diger’e? An, wek ku şêwirmend ç’areserîya pirsan r’aberî wî dikin, ew anegorî wan jî bir’yaran digire?

Mirov nizane çi jî bibêje!




Lê tiştek li ber ç’avan e, ew şêwirmend û alîk’ar, ên ku agahîyan didin bir’êz Serokdewlet, di k’arên xwe yên r’ewakirina Colanî da êdî gihîştine astek a pêwîst, û agahî û wêneyên wisa didin çapemenîyê û medya civakî, ku di nava r’aya giştî ya navnet’ewî da Tramp û Colanî/Aş-Şaraa wek du serokdewletên weke hev r’ewa û hevp’ar bên xuyan.[7]

Lewra jî, di nava civaka navnet’ewî da pirs r’ûdidin, k’a, gelo, k’ê Colanî wek serokk’omar hilbijartye, û erk’a wî çiqasî r’ewa ye? K’a îro gelê Sûrîyayê, an T’om Barrak, Erdoxan û Tramp wî wek serokk’omar dip’ejirînin?

Û di r’ewşek a weha da hêzên navdewletî, bi serk’êşîya DYA pirsa întêgrebûnê li k’urdan ferz dikin. Ma piştî wê, dema hêzên Şamê yên DAÎŞî û r’êjîma faşîst a T’irkîyayê bi destûr û di bin ç’avdêrîya qaşo hêzên hevpeymanî da t’evkujîya gelê k’urd pêkanîne, mirov çawa, bi çi awahî dikare bi wan hov û barbaran r’a bibe yek?

Belê, k’urdên R’ojava sûrîyayî ne, lêbelê, ev k’omên hov û barbar ên cerdevanîya navnet’ewî, yên ku bi alîk’arîya hêzên derva hatine û di Şamê da r’ûniştine, çi têk’ilîya xwe bi Sûrîyayê û sûrîyayan r’a hene?

Ji bo ku Sûrîya bi r’astî bibe welat û dewlet, divê ew di sêrî da di bin ç’avdêrîya hêzên navdewletî û Net’ewên Yekbûyî da ji hemû bermayên DAÎŞ-ê yên bîyanî bê paqişkirin. Û evên sûrîyayî jî, di nava wan da, wisa jî Colanî, di dagehek a navnet’ewî da bên darizanidin – ne ku t’enê ji bo sûcên wan ên berê, lê wiss jî ji bo t’evkujîya k’urdan, elewîyan û durzîyan. Divê merc û derfet bên amadekirin, ku hemû sûrîyayên li ber zulma r’êjîmên BAASî û DAÎŞî p’enaber bûne, veger’in, cîh û miskenên xwe, di welêt da r’êfêrêndûmek pêk bê (dîsa di bin çavdêrîya NY da!) r’êvebirîyek a demkî bê hilbijartin, komîsîona destûrî ji nûnerên hemû pêkhatîyên Sûrîyayê bê hilbijartin, ya ku Destûrekê ji bo vî welatî amade bike.

Divê hemû herêmên R’ojavayê K’urdistanê, yên ku dema r’êjîma BAASî bi projeya k’emera erebî (ango, ya erebkirinê), Efrîn û û bajar û herêmên dinê yên di serdema DAÎŞê da hatine dagerkirin, li gelê k’urd bên veger’andin, nivşên wan veger’in ser xaka xwe.

Wek ku tê zanîn, bi hemû kurt û kêmasî û siyaseta xwe ya dijmirovî va jî, dema desthilatdarîya baasîyan civakek a sûrîyayî pêk hatibûye, û di nava wê da gelek mirovne hêja, şaristanî, laîk, dêmokrat û pêşver’û hebûne. Û ew dijwar r’êvebirîyek a îslama r’adîkal bip’ejirîne, ya ku xwe li ser bingeha r’êgez û kevneşopîyên şerîetê r’adigire.

Û Efrîn jî, bi hemû r’eng û awazên xwe va, bi hemû t’aybetmendî û pêkhateyên xwe yên efrînî va wê demê gihîştibûye û pêk hatibûye, ya ku bi hevk’arîya DAÎŞ-ê û r’êjîma faşîst a T’irkîyayê hate dagerkirin û t’arûmarkirin. Ango, evên ku îro hatine Şamê û xwedîyên wan ên li Ankarayê ji BAASî û Beşar Esed jî xirab û xetertir in!





Û tiştekî balkêş jî!

Van r’ojên dawîyê k’urdekî me – Met’în Akbaba, bi r’êya dostan ji Ankrayê wêneyek ji min r’a şandibû û di binî da jî nivîsî bû: *“Binihêrin, Colanî çawa teqlîdê Tramp dike. Ew êdî xwe yekî wek wî dibîne, an dixwze bişibe wî!”*

---

[7] https://nupel.tv/trump-sara-ile-suriyedeki-krizi-gorustu/

Dibe jî. Dibe ku ev hewlên daîşîyekî duh be, ku bixwaze xwe wek Tramp bide xuyan.

Lê, eger ev propagandaya henberhevkirin û mînahevkirina Tramp û Colanî bi hewlên şêwirmendên Tramp bi xwe û hukumeta AKP ya T'irîyayê tê meşandin, û gihîştye asteke pêk'enîtîyê? – Jixwe, wezîrên T'irkîyayê, bi hemû pisporên xwe va ji sibê heya êvarê ji Şamê dernayên, wek ku, tuyê bibêjî, ew endamên hukumeta DAÎŞî ya Şamê ne! Û di encamê da her tiştî dikin, ku îmaja Colanî mîna û wek a serokdewletê DYA bidin xuyan, ji bo ku gav bi gav ç'avê civaka navnet'ewî fêrî wê bibe, û ew bê p'ejirandin!

Mirov çi dikare bibêje – teknolojîyên sîyasî – di praktîkê da!

Hemma, ya me k'urdan îro her pirsek heye – pirsa p'arastina R'ojavayê K'urdistanê ji êrîşên hevp'ar ên daişîyan û r'êjîma faşîst a Tirkîyayê, xwwdîderketina Kobanîya dorpêçkirî ye – ya bê av û êlêktrîk! Û ev jî di bin ç'avdêrî û pozê qaşo hevpeymanîyan da. Qaşo, hevpeymanîyên me jî, wek ku tê xuyan, êdî bazarîya xwe kirine biryara xwe dane û di wê derbarê da jî bi devê nûnerê taybet ê Donald Tramp vekirî r'agîhandine.

Piştî sed û deh salan Peymana Sayk's-Pîko ji gor'ê r'adikin, an wê bi şêwazekî dinê zêndî dikin?

Lê divê tiştek bê zanîn, Cîhan hemû mîna wan nîne, DYA jî, hemû wek wana nîne, di DYA da p'ir' mirovne dêmokrat, hûmanîst û aştîparêz ên hêja hene. Û gelek ji wan jî di Sênato û Kongrêsa Amêrîkayê da nûnerîya gelê xwe dikin. Û ev r'ewş, a ku di bin navê dewleta wan da di herêma R'ojhilata navîn û, bi t'aybet jî di Sûrîyayê da pêk hatye, ji hêla hemûyan va nayê p'ejirandin. Lewra jî divê em p'êwendîyên xwe bi wana r'a xurtir bikin...

Belê, em divê têk'oşîna xwe li her qadan xurttir bikin – li qadên siyasî û dîplomasî (di nav da, wisa jî – dîplomasîya gel!), li qadên p'arastinê – bi her awahî pişta p'arazvanên net'e-wî xurt bikin. Û p'arastina R'ojava jî ne t'enê li ser sînorên gund û bajarên R'ojava ye, divê gelê me, ciwan û pisporên me di sînorên dijmin da ji êrîşên wî r'a bibin asteng, wisa bikin, eger ew bi giştî R'ojava ji bîr neke jî, hîç nebe, nikaribe wisa hêsan hemû hêzên xwe berbi wir va bike nava t'evgerê. Ev şer'ê R'izgarîyê ye – Şer'ê pîroz ê man û nemanê!

Ya sereke – îro t'aevahîya gelê K'urdistanê – li welêt û dervayî welêt, li ser p'êyan e, R'ojava bûye ew cîgeha, ya ku hemû k'urdan digihîne hev û dike yek, û gelê me dê li ser vê p'êlê yekîtîya xwe xurttir bike û bi xwe li xwe û xaka xwe xwedî derbik'eve!

Ya sereke, divê em bawerîya xwe bi k'axazok û bir'yarên cerdevanekî navnet'ewî neynin û bi wan nexapin, ew û bir'yarên wan ne r'ewa ne, ew îro hene, dê sibê nînbin.

Wek ku ji bo t'evahîya gelên Sûrîyê, wisa jî ji bo me k'urdan Destûreke Bingehîn a r'ewa pêwîst e, ne ku kaxazokên cerdevanên DAÎŞî û bermayên faşîstan!

**Û – TÊBÎNÎYEK JÎ!**

DAÎŞ bi serê xwe îro ewqas xeter nîne, çiqas r'êjîma faşîst a T'irkîyayê hêz û helanan dide wê, û hêz û dewletên cîhanê yê hêgêmon jî dixwazin, wê wek hêzeke leşkerî vezêndî bikin û ji bo armanên xwe yênn mêtîngerîyê kar bînin. Jixwe T'irkîya bi xwe jî bûye dewle-tek a daîşî, Erdoxan jî di nava daîşîyan da wek emîr ê DAÎŞê yê ne formal tê zanîn, ewî ji fermandar û ç'ekdarên daîşî di T'irkîyayê da art'êşek a altêrnatîv a art'êşa dewletê saz kirye – art'êşa xwe! Jixwe têk'ilîyên Erdoxan ên bi vê r'êxistina t'errorist r'a baş tên zanîn. Ewqasî, mirov tê nagihîje, ev dewletên hevk'ar û hevp'arên vê r'êjîma faşîst çima ç'avên xwe li ser vê r'astîyê digirin. Ew ditirsin, li xwe mukur' bên, ku bi xwe bûne hevk'arên r'êjîma daîşî, an berjewendîyên wan jî di vê r'ewşê da hene?!

Di derbarê r'astîya T'irkîyayê da di cîhanê da bi dehan belgefîlm hatine weşandin – bi delîlên konkrêt ên pêbawer va, û mirov dikaribû ew hemû di cîyekî da tomar bikira û dosya-yek amade bikira – bi sernavê, em bibêjin, "Erdoxan û DAÎŞ" … Yek ji wan jî sala 2015-an di R'ûsîyayê da hatye weşandin.[8]

[8] https://yadi.sk/i/AaqRLXyjA 29grg – Her çendî ev film bi r'ûsî ye, lê derfet'ên ku îro di întêrnêtê da hene, dikarin bi hêsane pirsgirêkên wergerê bert'erf bikin.

Lê, heya eger ev hemû nînbûna jî, her Doza Kobanîyê[9], a ku r'êjîma Erdoxan/Baxçelî li dijî çalakvan û siyasetmederên k'urd vekirine, ji ber ku wana piştgirîya berxwedana Kobanîyê ya li dijî DAÎŞ-ê kirine, wek delîla here berbiç'av û girîng, t'êrê dike, ku Erdoxan û hevalbendên wî yên daîşî di dadgehek a navnet'ewî da darizînin! ...

**24. 01. 2026.** **Pyatîgorsk/R'ûsîya**

[9] Di vê derbarê da hûn dikarin bi hûrbînî li vir bixwînin: "Cîhana sewdaser – doza Kobanîyê"– https://www.academia.edu/119856446/CÎHANA_SEWDASER_DOZA_KOBANÊ_